Kurdistan
Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin
Tebax / 15-8-2022 Kurdistan-Hejmar (227) www.pdk-s.com

# Hêzên PYD Tirkiyê ji bo encamdana êrîşan ser Kurdistana Sûriyê han dide

Kurdistan



Di vê dema dawî de artêşa Tirkiyê hejmareke êrîş li hejmareke gundên Qamişlo û Amûdê û Dirbêsiyê û Dêrikê encam dan, ku bûne sedema koçberkirina xelkê, û belavbûna tirsê di nava welatiyan de. Hat eşkerekirin ku hêzên leşkerî ser bi PYD ve ji wan gundan êrîşî xalên artêşaTirkiyê dikirin, û ev yek jî bû sedem ku artêşa Tirkiyê jî hejmareke êrîşan encam bide.

Welatiyekî gundê sînor ji rojnameya Kurdistan re got, hêzên leşkerî ser bi PYD van êrîşên xwe Tirkiyê ji bo encamdana êrîşan ser deverên Kurdistana Sûriyê han dide,û ev yek jî bûye sedema ku xelk bêhtir koçber bibin û mal û milkên xwe bicih bike, tirs di nava gundiyan de belav bûye, û ti kes nikare di riwê wan de jî raweste.

Welatiyek din jî dibêje, bin bajarê me hemû bûne xendeq, û di nava van xendeqan de çûn û hatinê dikin, û zêdebûna liv û tevgera wan li ser jiyana me gef e.

# Karvedanên vegera pêwendiyên Tirkiyê û rejîma Esed

**Kurdistan-Bidûvçûn**




Rojnameyeke nêzîkî hikûmeta Tirkiyê diyar kir, egera wê yekê heye Serokomarê Tirkiyê Recep Tayîp Erdogan û Serokê Rejîma Sûriyê Beşar Esed pêwendiyeke telefonî encam bidin. Rojnameya “Türkiye Gazetesi” diyar kir, welatekî Kendavê û welatekî Afrîkayê navbênkariyê di navbera Tirkiye û Sûriyê de dikin. Li gor wê rojnameyê, egera wê yekê heye Erdogan û Esed pêwendiyeke telefonî encam bidin.
Wê diyar kir, “Tirkiyê pêşniyar kiriye ku bi Rûsya, Îran û rêjîma Sûriyê re li dijî Partiya Karkerên Kurdistanê li bakur rojhilatê Sûriyê çalakiyeke hevbeş pêk bînin.”
Li gor hatiye ragihandin, ev pêşniyar di civîna Sochî ya di navbera Erdogan û Serokê Rûsya Vladimir Putin de hatiye kirin ku Putin di civînê de ji Erdogan re gotiye, çareya baştir ew e, pirsgirêkên Tirkiyê yên li Sûriyê, bi hikûmeta Şamê re werin çareserkirin.
Ji aliyê xwe ve jî Erdogan jî aşkere kiribû, dezgehên hewalgiriya Tirkiye û Sûriyê di pêwendiyan de ne.
Heta niha hikûmeta Tirkiyê ev nûçe ne red kiriye û ne jî piştrast kiriye.
Wê rojnameya Tirkî eşkere kir jî, rayedarên Tirkiye û Sûriyê gihîştine qonaxa avakirina “komîteyek ji pisporan” ji her du aliyan û bi vî awayî danûstandin di navbera her du welatan de dê derbasî asteke nû bibin.
Her wiha Rojnameyê got ku Tirkiye daxwaza pêşxistina çarçoveya yasayên efûyê yên ku ji aliyê Beşar Esed ve hatine ragihandin dike, da ku di bin çavdêriya navdewletî de bên cibicîkirin, wek azadkirina girtiyên siyasî û betalkirina lîsteyên tawanên bi deh hezaran Sûriyan.
Wezîrê Derve yê Tirkiyê Mevlut Çavuşoglu ragihand ku di civînekê de li Belgrada paytexta Sirbîstanê, li ser piyan bi Wezîrê Derve yê rejîma Sûriyê re hevdînek pêk aniye û ji wî re gotiye ku divê aştiyek di navbera aliyên opozîsyona Sûriyê û rejîmê de pêk were.
Mevlut Çavuşoglu îro pêncşemê 11ê Tebaxa 2022yan li Enqerê piştî bidawîbûna Konferansa Balyozan civîneke çapemeniyê saz kir û li ser pirseke derbarê destpêkirina pêwendî û dîplomasiya di navbera Şamê û Enqerê de ragihand niha ti proseyeke gotûbêjan di astên bilind de nîne lê îstixbaratên her du welatan di pêwendiyê de ne.
Çavuşoglu eşkere kir ku wî di civînekê de li Belgrada paytexta Sirbîstanê bi Wezîrê Derve yê rejîma Sûriyê Faysal Mîqdad re li ser piyan hevdîtineke kurt pêk aniye û got, “Em her dem dibêjin di navbera aliyên opozîsyona Sûriyê û rejîmê de pêdivî bi aştiyekê heye û em ê weke Tirkiye her cûre piştevaniyekê bidin vê pêngavê.”
Wezîrê Derve yê Tirkiye Mevlut Çavuşoglu got: “Ev demek e Putin û rayedarên Rûs dibêjin em we ligel rejîmê bînin ba hev. Xwestin ku civînek di navbera Esed û Serokomarê me de pêk bê. Serokomarê me jî gotibû dê hevdîtinên îstixbaretên me bi sûd bin. Weke hûn dizanin di demên borî de jî hinek caran îstixbaratên me hevdîtin pêkanîbûn. Piştre qûtbûnek çêbû û niha careke din destpêkirin. Di encama hevdîtinên di asta îstixbaratan de gelek mijar tên rojevê. Min di civîna li Belgradê li ser piyan dema ligel wezîrên din diaxivîm berî xwarinê hevdîtinek kurt ligel Wezîrê Derve yê Sûriyê pêk anî. Di encamê de li wir me got take rêya çareseriya vî welatî lihevkirina siyasî û paqijkirina terorîstan e; kî be bila ew be, nav ferq nake.”
Mevlut Çavuşoglu eşkere kir: “Li aliyê din me got di navbera aliyên opozîsyona Sûriyê û rejîmê de pêdivî bi aşitiyekê heye û em dê weke Tirkiye her cûre piştevaniyekê bidin vê pêngavê. Em piştevaniyê li yekitiya axa Sûriyê dikin û ji herkesê bêhtir vê piştavaniyê dikin. Aşitî, yekitiya sînor û axa welatekê ku li kêleka me ye, rasterast bandoreke erênî li ser me dike. Em dibînin pêşhatên berevajî vê jî çi bandorê li me dikin. Ji ber wê jî her têkoşîneke li dijî rêxistina terorî bê kirin em dê piştevaniyê lê bikin.”
Herwiha got: “Çavê me ne li axa Sûriyê ye, lê eger li Sûriyê yekîtiyek çênebe, Sûriye rûbirûyî metirsiya dabeşbûnê ye. Welatên din jî dibêjin take armanca YPGê û PKKê dabeşkirina Sûriyê ye. Ji bo rêgirtina li dabeşbûna Sûriyê jî dive rêveberiyeke bihêz hebe. Çêbûna îradeyeke wiha ku parêzvaniyê li her bihusteke hemû axa Sûriyê bike jî bi yekitiyê çêdibe. Me hertim ev yek gotiye. Me ev yek wê demê jî ji wan re got. Ev ne civîneke taybet bû tenê sihbeteke li ser piyan bû.”
Piştî van daxuyaniyan, Li hemû navçeyên bakurê rojavayê Sûriyê ku di bin desthilata grûpên neyarên Şamê û hevpeymanên Tirkiyê de ne, li dijî gotinên Wezîrê Derve yê Tirkiyê Mevlut Çavuşoglu xwepêşandan dest pê kirin.
Xwepêşanderên ser bi grûpên li dijî Şamê, ala Tirkiyê dadixin û li dijî Enqerê ku hevpeymana wan a çend salan e, dirûşman dibêjin.
Xwepêşandanan li bajarên Efrîn, Idlib, Ezaz, El Bab, Girê Spî û Serê Kaniyê dest pê kirine.
Çalakvanên bakurê rojavayê Sûriyê daxwaz dikin ku îro xwepêşandan berfirehtir bibin û di destpêka nimêja înê de xelk derkevin kolanan û li dijî Tirkiyê nerazîbûna xwe nîşan bidin.Îtîlafê jî daxuyaniyekê lihevhatina ligel rejîma Esed red kir.

# Meriv çawa ji helbestvanekî kujer biafirîne?




Destpêkê de ez ê Cemîle Merkît bidim nasîn , ew yekemîn jina ku di nava PKKê de bi şêweyekî hovane hate kuştin "tasfiye kirin". Ew jî, weke Kesîre Yildirim û Sakîne Cansiz ji damezrînerê PKKê bû. Cemîle Merkît, xwişka Yildirim Merkît e, ku ji sazkarên PKKê ye û di sala 1994an de li Romanya ji aliyê PKKê ve hatiye kuştin. Cemîle Merkit jî di nava PKK'ê de serkirdeyek pir gewre bû, di heman demê de mamoste bû. Li ser daxwaza rêxistinê di sala 1978'an de bi endamê PKK'ê Elî Heyder Kaytan re zewicî. Ji damezrînerên rêxistinê Cemîle MERKÎT bi biryara rêxistinê bi Elî Heyder Kaytan re zewicî, ducanî bû, lê PKK nerazî bû ku jin ducanî bibin û 6 mehî zarok jiberkirin. Heta dibêjin, "Dema ku zarok jiber kirin, Elî Heyder zarok revand û avêt sobeya vêxistî û ew zarok şewtand." Dema ku Zaroka SEHER jiber kirin, nasnameya rastî ya PKK û a Ebdulleh Ocelan nas kir û helwest nîşan da, digot "Di nava partiyê de dîktatoriya yek zilamî tê avakirin." lê rêxistina PKKê Seher wekî xayîn ragihandin û di sala 1982'an de li lubnanê hat Terrorkirin (Piştî kongereya PKKê a duyemîn di sala 1982an de), Piştre birayê wê Yildirim Merkit û bavê wê jî ji aliyê rêxistinê ve hatin Terrorkirin.

Meriv çawa ji helbestvanekî kujer biafirîne? Ger hûn bixwazin bersiva xweş nas bikin, bi baweriya min divê mirov Elî Heyder Kaytan nas bike?

**Elî Keyder kî ye:**
Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê, endamê damezrîner ê PKK'ê ye.
Elî ku li Tunceliyê ji dayik bû, piştî Buyera 12'ê Îlonê reviya derve û li herêma kurdistana Iraqê fermandariya yek ji kampên perwerdehiyê yên PKK'ê kir.
Piştre ji bo komîteya navendî ya PKK'ê hate hilbijartin.
Ew kesek pir hestiyar bû. Dema ku ew aciz dibû digiriya. Ew ne hişk bû, bi rastî jî hestiyar bû. Elî helbestvanekî bi hestnazik bû. Dema hevalê wî Hakî Karar di sala 1977'an de li Dîlokê hat jiyana xwe ji dest da helbesta xwe ya binavûdeng "Ez mirov bûm" nivîsî.
Bi Cemîle Merkît a bi Sernavê "Seher" ku bi biryara rêxistinê pê re zewicî.
Weku me diyar kir Elî Heyder zaroka xwe kuşt, heger mirovekî helbestvan zaroka xwe ya bişewitîne, ew êdî ne mirov e. Tê wê wateyê ku PKK helbestvanek kuşt û mirovekî kujer afirand. Elî Heyder dizane ku dema hestê wî yê hundirîn hat kuştin çiqas êş kişand! Paşê hat halekî wisa ku; Nikaribû li ser hevjin û zaroka xwe jî bigirî. Hemû keştiyên xwe şewitandin, çû Koletiya Ocelan kir. Lê her Ebdulleh Ocelan jê nerazî bû, û vê yekê di hevpeyvîna xwe a di gel Melhem di pirtûka heft roj di gel ocelan dide diyar kirin( di rûpela wisa dibêje ku Elî di gel hevjina wî a xayîn kesîra hevkar bû ) lê elî dîsa li ser ekranên televîzyonê bi sedê caran got ku Ocelan pêxemberek e.
Piştre Elî Heyder Kaytan wekî nûnerê rêxistinê şandin Ewropayê.Di sala 1988an de li Almanyaya Rojava hat girtin.Piştî ku di sala 1994'an de serbest hat berdan, ji bo rêveberiya rêxistinê hate vegerandin.
Ji 28ê Cotmeha 2015an vir ve di lîsta sor a "terorîstên herî zêde tên lêgerîn" de ku ji aliyê Wezareta Karên Hundir a Dewleta Tirkiyeyê ve hatiye weşandin ih digire.
Elî Heyder Kaytan di 19.09.2019an de, di encama êrişa balafirên Tirkiyê de li Herêma Kurdistanê hat kuştin, lê Wezareta Navxwe ya Tirkiyê û PKK jî ev mijar veşartin û nûçeya kuştina wî belav nekirine!

## Kadirên PKK li nava welatiyan çi dikin, endamekî PJAK li Qamişlo çi dike

**Kurdistan**
**Ehmed Omer**

Droneke Tirkiyê roja 6ê Tebaxê otomobîlek di nava Qamişlo bombebaran kiribû û li gor daxuyaniyeke HSDê, di encamê de 4 kes hatin kuştin ku di nava wan de 2 zarok hebûn.Lê piştre derket ku endamên PKK di nava otomobîlê de jî hebûn.Piştre Desteya Hundirîn ya PYD ragihand, di êrişa Tirkiyê ya roja 6ê Tebaxê li ser taxa Pîşesazî ya bajarê Qamişlo de, endamê rêveberiya Partiya Jiyana Azad a Kurdisanê (PJAK) Yûsif Mehmûd Rebanî (Rêzan Cawîd) hat kuştin. Hejmareke welatiyên Qamişlo derbarê hebûna kadir û endamên PKK di nava wan de nerînên xwe anîne ziman. Welatiyek dibêje, hebûna van kesan di nava xelkê de metirsîdar e û dibine sedema kuştina xelkê sivîl, lewma pêwîste PKK û kadirên xwe ji nava Kurdistana Sûriyê derkevin û destêwerdanê di nava karûbarê me de nekin. Welatiyekî din jî dibêje, gelo endamê rêveberiya Partiya Jiyana Azad a Kurdisanê (PJAK) Yûsif Mehmûd Rebanî (Rêzan Cawîd) li Kurdistana Sûriyê çi dikir, hertim jî dibêjin kadirên PKK li cem nînin, divê dawî li hebûna van kesan were heta ku xelk nebin armanca dronên Tirkiyê.



# «Ez Kevok im» karvedan li pey xwe ve anîn







**Kurdistan**

Stranbêja navdar a Ereb Esala Nesrî strana “Ez Kevok im” a Kurdî got û li hejmara xwe ya tora civakî “Youtube” belav kir û gelek karvedan li pişt xwe anîn.

Hunermend Esala Nesrî strana folklorî ya Kurdî “Ez Kevok im” bi straneke din a Erebî têkel kir û li Youtuba xwe belav kir. Li jêr berhemê jî nivîsî ku ev stran gotin û awaz jî ji aliyê Arî Jan ve hatine danîn.

Li gel wê jî gelek karvedan li tora civakî li pişt xwe anî, tevî ku gelek bikarêhênerên tora civakî bi wê yekê dilxweş bûn ku hunermende navdar a Ereb straneke Kurdî dibêje, li hemberê jî gelek rexne li Esala û kompanyaya “Rotana” ya berhemanîna hunerî û bi taybetî li Arî Jan hat girtin ku wî straneke folklorî ya Kurdî ku gelek hunermendên Kurd bi zaravayên Kurmancî û Soranî jî gotine, li ser navê xwe tomar kiriye.

Asala Nesrî stranbêjeke Sûrî ye, sala 1969 li Şamê ji dayik bûye û li ser asta cîhana Erebî yek ji stranbêjên herî navdar tê hejmartin ku stranan bi zaraveyên Erebî yên cuda dibêje, wek Sûrî, Misrî û Kendava Erebî.

Arî Jan jî, mûzîkjenekî Kurd e û sala 1986an li Şamê ji dayik bûye, ji sala 2010 ve mûzîk ji gelek fîlm û rêzefîlmên Sûrî re danîne û di dema dawî çend klîpên bi awayê “Mashup” belav kirine.

Ji aliyekî din ve, hunermendê navdar ê cîhanî Îbrahîm Kêvo ku bi regezê xwe ji pêkhateta Ermen e û ji gundê Dugirê yê Amûdê yê Kurdistana Sûriyê ye, li ser hejmara xwe tora civakî “Facebook” derbarê beşa Erebî ya stranê de ragihand, wî sala 1998an li ser şanoya Keleha Helebê ev stran gotiye, gotinên stranê yên Izet Hedîdî ne û awaz jî ya wî ye.

## 13 sal in Aramê Dîkran ji nav me bar kiriye

**Kurdistan**

Di sala 1934an de li bajarê Qamişlo hatiye dinê. Aramê Dîkran di roja 8ê tebaxa 2009an de li Atînayê (Yewnanistan) çû ser dilovaniya xwe.

Kurmanc, Soran, Zaza, Loran, Goran û hemû Kurd wî û evîna wî ya ji bo kilamên cimaeta Kurdan nas dikin.

Sedem jî ew e ku hakimiyeta deng û stranên wî li ser dil û mejiyê mirovan bandorek taybetî çêdikin. Yek ji dengên ku hertim para kurdî ya Radyoya Êrîvanê di nava Kurdên her çar perçên Kurdistanê de dide guhdar kirin, dengê zelal ê Aramê Dîkran e.

Pirsa herî girîng ji bo Kurdan ev bû ku Aram Dîkranê Ermenî çawa wiha ji dil û bi şewatek tijî soz dikare stranên kurdî bixwîne?! Çawa dikare wiha li ser bedewiya deşt, zozan, dol û newal, mêrxas û egîdên Kurdan bistire? Aram kî ye ku nekitiye bin bandora siyaseta wan xwînmijên ku hertim dihola neyartiya kurdî û Ermeniyan lêdixistin û neteweya kurdî bi wê hîndê tawanbar dikirin ku di ferman û qira Ermeniyan de li rex Osmaniyên xwinxwar, cih girtine!? Û gelek pirsên din. Lê emeknasî û famkirina siyaseta çewta dagirkerên Kurdistanê ji mêj de bû ku di malbata Aramê mirovhez de hatibû famkirin.

Bi vî awayî Aram, li herderê bi birayên xwe yên kurd re jî û şîreta bavê xwe yê emeknas heya roja îro jî ji bîra nekiriye. Heya roja îro jî li ser vê riya dûr û dirêj Aramê hêja dimeşe. Sala 1966´an gelek Ermeniyên ku li welatê Sûriyê dijîn, vegerîn welatê bav û kalên xwe Ermenistanê. Li wir bû ku Aram bi hevkariya Xelîl Muradov ku berpirsyarên para kurdî ya radyoyê bûn, bi awayekî berfireh dest bi karê xwe yê stranbêjiyê kir. Carek din jê re hat îsbat kirin ku kurdî li her derê mêranî û mêvanperweriya xwe wenda nakin.

Bi serhev de mirov dikare bêje ku naveroka stranên hunermend Aramê Dîkran pênaseya hunermendî, kesayetî û dilpakiya wî ne. Bedewiya erdnigariya Kurdistanê, dewlemendiya ziman, stran û bi giştî kultura Kurdan, heza ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê, selmandina biratiya Kurdî û Ermeniyan, evîna ji bo Gerîla û şervanên riya bi şan û şerefa azadiyê, evîna ji bo mirovantiyê, canfîdayiya egîd û lehengên Kurdistanê ku bi netirsî canê xwe fîda kirin, wefadarî û emeknasî û... tev kevir û binaxê stranên Aram Dîkran pêktînin.

Bi salaye ku ew wek dergevanekî xwendingeha hunera Kurdistanê bi dengê xwe yê germ û nerm dewlemendiya lorîk, stran û zimanê şirînê Kurdî bi bîra herkesî tîne. Aram bûye nîşana demokrasiya di navbera gelên Rojhilata Navîn de. Wî di piratîka xwe de daye xuyakirin ku hemû gelên Rojhilata Navîn dikarin bi hevre û di nava aştî û biratiyê de bijîn. Dema ku ji sala 1915an û pêde genosîda li dijî gelê Ermenî (cîranên Kurdan yên dîrokî) bi destûra nifşparêzên Împeratoriya Osmanî



destpêkir, Kurdan gelek ji wan di nava dilê xwe de veşartin. Kurdan nedikarîn bibînin ku neviyên Mongolan li ber çavên wan birayên wan bikujin.Herkes nikare muzîkê bi guhdarên xwe bide hezkirin. Ger hunermend bi deng û awazên xwe di vî karî de biser nekeve, nikare muzîka xwe mîna xwarina riha mirovan, pêşkêşî gel bike.